



Kî alikariya kerguhê pasqaliyê dike

Pirtûkeka pir çand bi wêne

Anmerkung

Das kurdische Vokabular ist nicht standardisiert. Im *Kurmanci* gibt es verschiedene dialektale Bezeichnungen für Hasen. Die beiden häufigsten sind **kerguh** (= Eselsohr) und **kêvroşk** (auch *kewrîşk* oder *keroşk*). Kinder kennen aus ihrer Familiensprache also je nachdem das eine oder das andere.

2 ● 3



“Ez ji we re tişteki bêjim?

Ez kerguhê pasqaliyê me.

Her bahar ez ji zarokan re tiştên baş yê n pasqaliyayê vedişêrim.

Îro, ez boyaxan amade dikim, sibe ezê hêkan boyax bikim.

Îsal ez dixwazim wana bi taybetî xweş boyax bikim.

Heta ku mirîşk û dik hêkan wînin, hên hinek wext maye.

Ma hûn dixwazin di vê navberê de kerguhên çokolata bibînin?”

4 ● 5



“Li vir, li zêzemînê tarî û sar e.

Hemû kerguhên çokolata li vir hazir in.

Zarok wê pê kêfxeş bibin!

Binê, dik bang dike. Niha wê hêkan wînin.”

6 ● 7



“Ewqas pir hêk!” Kerguhê pasqaliyê pê kêfxeş dibe.

Dik bang dike: “Emê erebê tijî hêk li vêre bisekinînin.”

Mirîşk dike şaqe şaq û dibêje: “Min û hevalên xwe van hêkan kirin.

Û ewana hatine kelandin jî.”

Dik hatir ji wan dixwaze, dibêje: “Qi qi qi qi i i!”

Kerguhê pasqaliyê bang dike, dibêje: “Hêle bisekinin, ez dixwazim li motorê cot sivar bim û hinekî bi rê herim. Meriv pir baş tê dihejandin û dihezandin.”

8 ● 9



Bi rastî, motor meran dihejîne û dihezîne.

Kerguhê pasqaliyê ji kêfa re dikene.

Lêbelê ji ser motorê cot teqlê werdide û – go gum – li erdê dikeve.

Dibêje: “Ay, nigê min”, û dinale.

1 ● 2 ● 3



10 ● 11



Mirîşk bang dike: "Vay vay, nigê te bêguman ferqizî. Ji ciyê xwe melive, ez dixwazim paçekî lê bigerînim û girêdim. Lazim e ku qet tu nigê xwe du hefta nelivîni." Kerguhê pasqaliyê vediciniqe û dibêje:

"Wa nabe. Lazim e ku ez hêkên pasqalyê giyan boyax bikim."

Mirîşk dibêje: "Şaq, şaq, şaq, em kanin alikariya te bikin."

"Na, mirîşka delal, wa nabe, hêkên pasqalyê kerguh tenê kanin boyax bikin, bi nigên me yên nerm. Lê ez çi bikim?"

Ez niha nikanim hêkan boyax bikim û veşêrim.

Bê hêkên pasqalyê rengareng cejna pasqalyê nabe."

Li ser darên sêncên bexçê, kevokan venabû.

Wanan ew gotinên wan hemî bihîstin. Dikine "qurre qurr" û bi hev dişêwirîn, dûra difirin û diçin.

16 ● 17



Kerguhê pasqaliyê bi xem li ser çayirê mexelibû.

Wî ji nişkê ve bi sedan dengên nigên kerguhan dibihîse.

"Vay, ev çiyê?" Bi ecêb vediciniqe û bang dike:

"Ev çi behtewarî ye ku hûn têne. Ma hûn têne alikariya min bikin?"

18 ● 19



Hên pir zêde kerguh têne, ji her derê dinyayê, ji dûr û nezik ve têne.

Kerguhê pasqaliyê pir kêfxweş dibe.

Ji bo boyax kirina hêkan, kijan boyax û rengan tevlihev dibin, gişkiya rabere wan dike.

1 ● 2 ● 3



20 ● 21



Ewanan bi hevalên xwe hemûyan re dest bi kar dikin.
Hêkan pir baş û xweşik boyax dikin.
Dikenin, sohbet dikin û ji seyahatên xwe behs dikin.
Kerguhê pasqaliyê bi ecêb li wana dinêre.
Her hêkek ji hêkekê çêtire.

22 ● 23



Êvara paşînê berê pasqaliyê, hemû kerguh diherine malan û parqê bajêr.
Ecele, ecele hêkên xweşik û kerguhên çokolata vedişêrin.
Kerguhê pasqaliyê dike piste pist: "Hele binêrin, gizêrek. Zarokan ji me re tiştêkî baş anine." Berî ku roj here ava, hemû hediyan pasqalyê hatin veşartin.

24 ● 25



Dûra kerguhê pasqaliyê bang dike: "Niha em cejneke je xwe kerguhan re çêbikin. Ew cejna wê bi saz û sohbet, bi bazdan, bi gîhan, bi xasan û bi gizêran çêbibe!" Kerguh gişkî hemû roj û şevêkê bazdidin, hilor dibin û lotik davêjin, û dikine mirçe mirç, xwarinê dicûn û dixwin.

26 ● 27



Wexta ku dikin je hev veqetin û herine mala xwe, hemû bi cure cure zimanan xatir ji hev dixwazin: "Hasta luego!"
"Güle güle!"
"Arrivederci!"
"Auf Wiedersehen!"
"Salê tê emê dîsa werin hev bibînin!"

1 ● 2 ● 3